

Daxwîyanî



Ji Raya gishtî ra ya cihanê, Civaka Êzîdî, Serok û Rêberên Kurdistanê re !

Rêzdarên hêja,

Nuçeyên divan rojên dawîde, ji Kurdistanê radigihin me, me gelekî xemgîn dikin û dikin nav gumana. Qewimandina bûyarên bi vî shiklî, di vê pevajo ya esasde jibo Kurd û Kurdistanê birîndariyek xetere û jibo Partîyên Sîyasî ên ku Pêshengîyê ji Azadîya Kurdistan re dikin, shermîyek mezine .

Bûyera ku, liser jineke misilman, jiber zilm û zora mêrê xwe, xwe avêtî tor û bextê Êzîdîya li Shêxan qewimî bu, Roj bi Roj berfirehtir dibê. Çiqasî ev heft roj derbas buwibin jî û hatibê gotin ku, hêzên asayî ên Kurdistanê li Shexan' in jî, ji aliyên misilmanê eshîra goran û derdor ve, bi awayekî hovane êrîsh berdewam dikin.

Banga me weke **YEKÎTÎYA CÎWANÊ ŞERFEDÎN** li Elmanya, ji hemu sazî û rêxistinên ku, qedir û qîmet didin merovahiye heye, ku li hember van bûyaran bê deng nemînin em daxwas dikin kesê kû ev bûyer pêk anîna pêwîsta der hal derkevin peşberî dadgihê û werin cise kirin û lêborîna xwe ji civaka Êzîdî bixwasin. **Êzîdîyên dilsoz û bi rûmet** dengê xwe li hember vê nihaqîya ku, li civaka Êzîdî tê kirin bilind bikin. Bi Teybetî Partîyên Sîyasî ên Kurdistanê divê bi awayekî lezgînî mudaxele yê vê hovîtiya ku li civaka Êzîdî tê kirin bikin.

Gava mirov, rewşa Eraqê tevlîhev bidê berçavên xwe, bûyarên bi vî shiklî çêdibin, karin bibin sebeba kumkujîya. Bi vê minasebetê, divê bi teybetî civaka Êzîdî ku li derveyî welat dijî, bi awayekî berpirsyar tevhev bigerin. Em weke mal Êzîdîyan yecs li Elmanya, van hêrîshên hovane, ku dibin ser Êzîdîyên herêma Shexan, em bi awayekî vekirî sermezar dikin û ticara qebul nakin.

Bi teybetî emê weke Rêxistinek civaka Êzîdî di hember van bûyaran de, ticara bê deng nemînin. Heger ku em weke rêxistin û yekkesên civaka Êzîdî bi awayekî berpirsyar tevhev negerin, çêdibê ku siba gelekî dereng bê. Wî çaxî wê dîrok hesenîka li me bi barîne. Divê em vê bash zanibin. Bê guman, divê ku em nerazîbuna xwe, di çarçevayê demokratîk û ashîtyanede bikar bînin. Û ji Kural û qaîde welatên ku em dinavda dijîn rêz bigrin.

Divê em vêjî bash zanibin ku, civaka Êzîdî di nava van gengêshîya de, bi tanê hatî hishtin. Lewma jî, em dibêjin dem dema hevgirtin û tifaqêye. Bila êdî, em vekirî karibin bêjin ku, em weke civaka Êzîdî, qîma xwe, bi qebulkirina tenê Kurd nayînin. Em shirikê axa Kurdistanê ne. 72 ferman li me rabun ji van 72 Ferman Kurdên misilman piraniya xwe dinavdebûn. Dîsa jî, me bi çavekî biratî li wan nêrî û destê dostanî û hevaltîyê dirêjî wan kir. Lê mixabin ewan her tim bi çavekî dijminatî li me nerî û bi nêta xerab destê xwe dirêjî me kirin û dikin.

Lewma jî, em weke YEKÎTÎYA ÊZÎDÎYÊN CIWANÊ SERFEDÎN

bi awayekî vekirî dibêjin ku, pêwistîya Civaka Êzîdî bi tevgeraka azad û herzek serbixwe heye.

Bi teybetî divê ciwanên Êzîdî bi rêxistin bibin.

Heger ku tevgerek civaka Êzîdî serbixwe û azad çênebê, bahwer bikin îro li Shexan bu, siba wê li Shengal, Qamishlo û wê disiba li Mêrdîn, Weranshar û Batmanê jî, ev yek bi serê civaka Êzîdî' de bê kirin.

Durushma civaka Êzîdî bila êdî; Tifaq, hevgirtin, Biratî û Ashtîya navxweyî bê.

Bi navê Rêveberîya Yekîtiya Ciwanên Serfedîn Mala Êzîdîyan Sulingen.

SILAV Û RÊZ

TÊKILÎ:

www.yecs.de yecs@hotmail.de

YEKÎTÎYA ÊZÎDÎYÊN CIWANÊ SERFEDÎN